
# ئارارات

دەرهێنەر: کۆمەڵەی کوردستانی لە ئیسکیلستوونا

ژمارەی دووهەم Mars/April 1994

## دوو لاوی وەرزشکار

عەزیز سەفەری و عوسمان سەفەری، دوو برای یاریچیی تۆپی پێ لە شاری ئێسکیلستوونان کە بەهەوڵ و تەقەلایان توانیویانە گەلێ سەرکەوتن بۆ تیپی کوردستانی ئەم شارە بە دەست بێنن. ئەم دوو لاوە کوردە لەدایکبووی ناوچەی زەهاون کە دەکەوێتە گەرمیانی کوردستانی ڕۆژهەلاتەوە. ئەوان تەمنیان پتر لە




## ئەو نەخۆشییانەی بە هۆی پەیوەندیی جنسییەوە دەگوێزرێنەوە

### نەخۆشیی ئەیدز AIDS

### مێژووی سەرهەڵدان:

نەخۆشیی ئەیدزAIDS کە کورتکراوەی "Acquried Immun Deficiency Syndrom"ە، واتە

## سوید بناسین

### سوید وڵاتی پەنابەران و کۆچەران

ح. هاشمی

سەردەمێك لێرە لە بەر سەرما و بەفر و بۆران و کڕێوە و سەهۆڵ، چاو چاوی نەئەدی و کەسی لێ نەدەژیا. ١٢ هەزار ساڵ لەمەوپێش کاتێ سەهۆڵەکان توانەوە، وردە وردە خەڵك ڕووی نایە چۆڵەوانیی سوید و

## لە لاپەڕەکانی ترا:

* تازەترین بیرورا دەربارەی کوردستان
* چالاکی کۆمەڵە
* شێعر
* شەوئاهەنگێگی نەوروزیانەی خۆش
* کورتەهەواڵ

# ئەو نەخۆشیانەی بە هۆی پەیوەندیی جنسییەوە دەگوێزرێنەوە

# S.T.D.

بێهێزی و کەم و کورتیی سیستەمی بەرگریی لەش و بۆ یەکەمجار لە ساڵی ١٩٨١دا دۆزرایەوە, بەڵام نیشانەکانی ئەم نەخۆشییە و چۆنیەتیی بڵاوبوونەوەی لە ساڵی ١٩٦٠دا لە وڵاتەکانی ئەمریکای ناوەڕاستدا هەستی پێ کراوە. لە ساڵی ١٩٨٣دا جۆرە ڤایرۆسێك لە خوێنی ئەو کەسانەی وا تووشی ئەم نەخۆشییە ببوون دۆزرایەوە، ئەو ڤایرۆسە ناو نرایە "HIV"کە کورتکراوەی "Humman Immunbrist Virus"ـە و واتە ڤایرۆسی کەمکردنەوەی رادەی توانایی بەرگریی لەش.

## رێگاکانی تووشبوون

مرۆڤ لە سێ رێگاوە تووشی ئەم نەخۆشییە دەبێت یان دەکرێ بڵێین ئەم نەخۆشییە لە سێ رێگاوە بڵاو دەبێتەوە.

١- لە رێگای خوێنەوە واتە ئەگەر خوێنی تووشبوویەك بە نەخۆشییەکە بچێتە لەشی کەسێکی ساغەوە.

٢- لە رێگای هەموو چەشنە پێوەندییەکی جنسییەوە. "پتر لە نیوەی ئەم نەخۆشییە لەم رێگاوە بڵاو دەبێتەوە و زۆربەشی لە ناو هاوجنسبازەکاندا."

٣- لە رێی دایکەوە بۆ کۆرپەلەکەی واتە زکماکی. بە پێی رێکخراوی جیهانیی لەشساغی "WHO" هیچ بەڵگەیەك بە دەستەوە نییە کە ئەم نەخۆشییە لە رێگای ماچ کردنەوە بگوێزرێتەوە بەڵام لە لیکی زاردا ڤایرۆسی "HIV" هەیە و ئەگەر ناو زار بریندار بێت و خوێنی لێ بێت لەوانەیە رامووسانی قووڵ ببێتە هۆی بڵاوبوونەوەی ئەم نەخۆشییە.

نیشانە تایبەتییەکانی ئەم نەخۆشییە بریتین لە: ژانی توند لە قورگدا، ژانە سەر، یاوکردن، ئاوسانی لیمفەوی، هەست بە ماندوویی کردن، لاواز بوون و ئارەق کردنی شەوانە. رادەی پیشاندانی نیشانەکانی ئەم نەخۆشییە لە کەسێکەوە بۆ کەسێکی تر جیاوازیی هەیە و پێوەندیی بە رادەی توانای بەرگریی لەشی هەڵگری ڤایرۆسی "هـ، ئ، ڤ،" هەیە. دەورەی شاراوەی ئەم نەخۆشییە ئەتوانێت تا حەوت ساڵ درێژەی هەبێت، جا لەوانەیە هەڵگری ئەم ڤایرۆسە لە هەموو بارێکەوە ئاسایی بێت بەڵام بەراستی ئەتوانێ ئەم نەخۆشییە بڵاو بکاتەوە. ئەمە ئەو راستەقینە دەردەخات کە مرۆڤ دەبێت لە پێوەندیی جنسیدا لە گەڵ کەسێك کە بە رواڵەت نورماڵە ئەوە لە بیر نەکات کە لە کۆندۆم کەڵك وەرگرێ.

## رێگای بەرگری

بۆ بەرگری لە بڵاوبوونەوەی ئەم نەخۆشییە پێویستە؛

-لە پێوەندیی جنسیدا لە کۆندۆم کەڵك وەرگیرێت، جا ئەو پەیوەندییە بە هەر شێوەیەك بێت.

-ئەو دایکانەی وا هەڵگری ڤایرۆسی ئەم نەخۆشییەن لە منداڵ کردن خۆ بپارێزن.

-گشت ئەو خوێنانەی وا ئەکرێنە لەشی نەخۆشەکانەوە تاقیکرێنەوە.

- لە بە شەڕ هاتن لە گەڵ ئەو کەسانەی وا هەڵگری ئەم نەخۆشییەن خۆ بپارێزرێ.

## سەرنجێکی پێویست

ئەگەر دوای پێوەندیی جنسی لە خۆتان دەترسن و دوو دڵن تکایە خوێنی خۆتان تاقی کەنەوە.

رەنگە بڵێن لە کاتێکدا هیچ چارەیەك بۆ لە بەین بردنی ئەم نەخۆشیی نەدۆزراوەتەوە سوودی خوێن تاقیکردنەوە چییە؟ بەڵام ئەم کارە بکەن لە بەر ئەم دوو خاڵەی خوارەوە:

١- دەبێتە هۆی بەرگری لە بڵاو بوونەوەی ئەم دەردە بێدەرمانە لە کۆمەڵدا.

٢- بە دەوا و دەرمان نەخۆشەکە دەتوانێ ماوەی ژیانی خۆی درێژتر کاتەوە. دابنێین شەش مانگ تا ساڵێك، ئەگونجێ زۆرتریش. جا بە چ دیارە لەو ماوەیەدا دەوایەك بۆ چارەسەرکردنی ئەم نەخۆشییە دروست نەکرێت؟

پەشێو مەریوانی، خوێندکاری زانکۆی رادیۆلۆژی خوێندگەی بەرزی لەشساغی، یۆتەبۆری

## شیعر

### "فرۆکە"

فرۆکە بێگیانە
بەڵام شتێکی جوانە
زۆر بە کەڵك و رەوایە
ئەڕوا بۆ هەموو لایە
لەم وڵات بۆ ئەو وڵات
مرۆڤ و باریش ئەبات
هەیەتی چەند مەکینە
تیژ ئەڕوا وەك سەفینە
بۆ هەر وڵاتێك بڕوات
ئەو ئەپێوێ بە چەند کات
زانست و فەنی ئەمڕۆ
ئەبێ فێر بین من و تۆ

-مەحموود بەرزنجی-

** ** ** ** ** ** ** ** **

دەپەرستم وڵاتەکەم
وڵاتی جێی خەباتەکەم
دەپەرستم کێو و داری
هەموو خاکی کوردەواری
دەپەرستم شاخەکانی
لە گەڵ قەبری شەهیدانی
دەپەرستم نیشتمانم
جێگەی کورد و کوردستانم

- شاخەوان -

# سوید بناسین

## سوید وڵاتی پەنابەران و کۆچەران

ئەم سەهۆڵستانەیان ئاوەدان کردەوە. پاشان خەڵکانی تریش لە ڕێی جۆرواجۆرەوە کۆچیان کرد بۆ سوید.

لە سەدەی ناوەڕاستدا بازرگانە ئەڵمانییەکان و لە قەرنی ١٦٠٠یشدا ئاسنگەرانی بەلژیکی و لە درێژاییی ١٥٠٠ و ١٦٠٠یشدا فینلەندییەکان ڕوویان نایە سوید. لە ئاخر و ئۆخری شەڕی جیهانی نزیکەی ٢٠٠ هەزار کەس کە زۆربەی خەڵکی باکوور بوون، پەنایان هێنایە سوید. ١٩٤٤ نزیکەی ٣٠ هەزار باڵتی لە ڕێی دەریاوە هاتن بۆ سوید. نزیکەی ٧٠ هەزار نەرویژی و دانیمارکی لە ترسی ئەشکەنجە و زیندان و کوشت و بڕ لێرە پەنایان گرت. دەوروبەر ٧٠ هەزار منداڵی فینلەندی لە ماڵە سوێدییەکان جێ و ڕێیان پێ درا. نزیکەی ٣٠ هەزار کەس بە یارمەتیی خاچی سوور لە ئۆردووگا زۆرەملێیەکانی ئەڵمانی ڕزگاریان بوو و گوێزرانەوە بۆ سوید. لە درێژاییی نیوەی دووەمی سەدەی ١٨٠٠دا پتر لە یەك میلیۆن سوێدی لە داخی هەژاری و بێدەسەڵاتی سوێدیان بەجێ هێشت و ڕوویان نایە وڵاتانی تر بەتایبەت ئەمریکا. لەم ساڵانەی دواییەدا، دەیان هەزار کەس بە شوێن ژیانێکی مرۆڤانە و دوور لە شەڕ و شووڕ و ئەشکەنجە و لێدان و زوڵم و زۆری دیکتاتۆران، ڕوویان ناوەتە ئێرە و داڵدەیان وەرگرتووە. لە ١٤-٤-١٩٩٤دا دەوڵەت بڕیاری دا ئەو پەنابەرانەی پێشتر لە یەکی ژانفییەی ٩٣ هاتوونەتە سوید، بۆیان هەیە بمێننەوە، ئەم بڕیارە نزیکەی ٢٠ هەزار کەس کە زۆربەیان کۆسوئالبانن دەگرێتەوە.

لە درێژایی مێژوودا خەڵك بۆ ئێرە و لێرە کۆچیان کردووە. ئەوانەی ماونەتەوە دەستیان لە دەست یەك ناوە و وڵاتێکی پێشکەوتوو و هێمنیان دروست کردووە.

ساڵی ١٩٩١ نزیکەی ٨١٤٠٠٠ کەس لە سوێددا دەژیان کە لە دەرەوەی سوید لە دایك ببوون، نزیکەی ٤٠٠ هەزار کەس لەمانە هاووڵاتێتیی هەندەرانییان هەبوو. نیوەی کۆچەران خەڵکی وڵاتانی باکوورن. بە گوێرەی سەرژمێریی ساڵی ١٩٩١ هەندێ لەو پەنابەرانەی کە لە سوید دەژین بەم ڕادەیە خەڵکی ئەم وڵاتانەی خوارەوەن:

| | | |
|---|---|---|
| فینلەند: | ٢١٥٠٠٠ | کەس |
| نەرویژ: | ٥١٠٠٠ | کەس |
| یۆگۆسلاڤیای پێشوو: | ٤٥٠٠٠ | کەس |
| دانیمارك: | ٤٣٠٠٠ | کەس |
| ئێران: | ٤٣٠٠٠ | کەس |
| پۆلەند: | ٣٧٠٠٠ | کەس |


* * *

## کێ پەنابەرە؟

ئەوڕۆکە نزیکەی ١٥ میلیۆن خەڵك لە ترسی هەژاری و برسێتی و کوشتار و ئەشکەنجە و زیندان ئاوارە و پەڕیوەی وڵاتانن و گەلێکی زۆریش لە ناو وڵاتەکەی خۆیاندا لە بەندیخانە یان لەم کون بۆ ئەو قوژبن خۆیان دەدزنەوە. ژمارەیەکی هەرە کەم دەتوانن پاش هەزاران زەحمەت و چەرمەسەری بگەنە وڵاتێکی هێمن و دڵاوا. ئاخۆ کێ، بۆی هەیە داڵدەی بدرێتێ و یاسا و قانوون کێ بە پەنابەر دەناسێ؟ یاسای سوید لەو بارەوە دەڵێ: "ئەگەر کەسێ پێویستی بە پەنا هەبێ، نابێ بەبێ هۆ پەنای نەدرێتێ. پەنابەر کەسێکە کە لە وڵاتەکەی خۆیدا لە بەر ڕەگەز، ئایین، نەتەوە یان لایەنگری لە ڕەوتێکی سیاسی ترسی سزای گرانی هەبێ. کەسێك کە گۆڕەپانی شەڕی بەجێ هێشتووە یان لە ڕۆیشتن بۆ شەڕ سەرپێچی کردووە، پەنابەرە و دەتوانێ لە سوید پەنا وەرگرێ. پەناخوازێك کە بێت بۆ سوید دەتوانێ لە سەر سنووردا داوای پەنابەری بکا. وەزارەتی کۆچەران لە داواکارییەکەی دەکۆڵێتەوە و لەو ماوەیەشدا جێ و ڕێیەکی دەدرێتێ. لەوانەیە ماوەیەکی زۆر بخایەنێ کە وەڵامی داواکارییەکەی بدرێتەوە. ئەوەی پەنابەریی دەدرێتێ خانوو و جێ و ڕێی بۆ دابین دەکرێ و دوایییش لە یارمەتیی دەوڵەت بێبەش ناکرێ. ئەگەر وەڵامی ڕەد بێتەوە، پەناخوازەکە بۆی هەیە سکاڵانامە بنێرێ بۆ دەوڵەتیش. ئەگەر وەر نەگیرێ، لە سوید دەر دەکرێ. ئەوڕۆکە ڕێژەیەکی زۆر لە پەناخوازان وەڵامی ڕەدیان دەدرێتێ.*

ح. هاشمی

# تازەترین بیروڕا دەربارەی کورد و کوردستان




تازەترین بیروڕا دەربارەی کورد و کوردستان

کوردستان یان کوردەواری وڵاتێکی گەورە و هەرا و بەرینە و بەشی هەرە زۆری وە بەر تورکیە کەوتووە، بەشێکی زۆر گەورەشی خراوەتە سەر ئێران و هێندێکیشی لای ژوورووی عیراقی لێك هاتووە و هەر بە ناوی دانیشتووەکانیەوە ناودەبرێ، کە هەموو کوردن.

تورکەکان بۆ مەبەستی سیاسیی خۆیان ناوی کوردستانیان لە جوغرافیا و دەفتەری دیواندا سڕیوەتەوە، ئەو وڵاتەی لە تورکیا ناوی کوردستان بووە، هەروەها ئەستانی کوردستانی ئێرانی ئێستا، هەموو شار و مەڵبەندەکانی کوردنشین ناگرێتەوە و سنوورەکانی نەتەوایەتی داناگرن.

سنوورەکانی نەتەوایەتیی کوردستانی گەورە، زۆر دژوارە کە بە وردی دیاریی بکەین، چونکە:

* هەر زۆر لە زووەوە لە لایەن دەسەڵاتدارانەوە، ژمارەیەکی یەکجار زۆر لە تورکمان و عەرەب و فارس کۆچیان پێ کراوە، دە کوردستان خزێنراون و تێکەڵاو بە کورد کراون.

* زۆر کورد لە کوردستان ئاوارە بوون و دەگەڵ بێگانەی دراوسێدا رەگەزیان لێك هاڵاوە.

* دەوڵەتە ئیسلامییە گەورەکان، زۆریان ئاڵوگۆڕی ئیداری و سیاسییان کردووە و کوردیان دابەش کردووە، شوێنەوار و سنووری نەتەوایەتیی گەلانیان دەسکاری کردووە.

* هۆی هەرە گرینگیش ئەوەیە خوێنەواری کورد هەستی نەتەوایەتیی خۆیان بەرانبەر بە ڕێوشوێنی تازەی زانیاری پەروەردە نەکردووە و لە نووسین و بڵاوکردنەوەی بیروباوەڕدا زمانی خۆیان بەکار نەهێناوە و بەهۆیەوە زمانی نیشتمانیمان لە شارە گەورەکاندا لە ناو چووە و زمانی کوردی هەر لە چیا و چۆڵان ماوە، خەڵکی گوندان و کۆچەران هێشتوویانەتەوە.

ئێمە سنووری نەتەوایەتیی مێژوویی کوردستان نیشان دەدەین ئەگەر دانیشتوانی هەندێکیشیان بە کوردی نادوێن.

کوردستان لە شیمالەوە (باکوور)، دەگاتە چیای ئارارات کە ئەو چیایە لەمپەرێکی جوغرافی و سیاسیی نێوان ئێران و رووسی و تورکیە و سنووری نیشتمانی و رەگەزایەتیی کورد و فارس و ئەرمەنە.

لە جەنووبەوە (باشوور)، دەگاتە جەبەل حەمرین کە لە نێوان عێراق (بەغدا و بەسرە) و کوردستانی عێراق کە ولایەتی موسڵ پێشووی تێدایە.

رۆژهەڵاتەکەی لەو سەری لوڕستانەوە دەست پێدەکات. رۆژئاوای دەگاتە ولایەتی مەڵاتیە لە تورکیا.


بە وێنیە؛ هەموو ویلایاتی شەرقی تورکیا جگە لە ویلایەتی تەرابزون و بەشێك لە ویلایەتی ئەرزەڕۆم، کوردە و لە ناو سنووری کوردستاندا هەڵکەوتوە.

هەروەها بەشی باشووری ئێستای ویلایەتی تەورێز و هەموو ئەیالەتی کوردستان و لوڕستان لە ئێران دەکەونە سەر سنووری کوردستانی مەزنەوە.

زۆربەی هەرە زۆری خەڵکی شارەکان و دانیشتووی چیاکان و رەوەندەکانی ناو ئە وسنوورە گەورەیە بە خوێن و زمان و رێ وشوێن کوردن. بەڵام کە فارسی و تورکی و عەرەبی لە شارە گەورەکاندا دە بیستری ئەوە فیتی ئێران و عێراق و تورکیایە کە کوردستانیان بە سەردا دابەش کراوە.

"لە شەرەفنامەوە."
-ئامادە کردنی تارا-

# پێشانگای هونەری کوردی



رێکەوتی ٥ی ٣ پێشانگایەك بۆ کۆمەلێك لە هونەرمەندانی کورد بەسترا لە شارەکەمان، شایانی باسە بەڕێز (LARS KOLLBERG) هەستا بە کردنەوەی تابلۆکان لە کاتێکدا سەردانی کوردستانی کردووە. ئەو هونەرمەندانەی کە تابلۆیان بەشدار بوو بوو، بریتین لە(ئیسماعیل خەیات، نامیق حەمە فەرەج، عەلی جۆلا، عەلی کەریم، حسام حەکیم، نەجمە محەمەد، ئامۆز عەلی قادر، چیمەن ئیسماعیل، نامیق دەرویش، هیوا عەبدولا). جگە لەوەش سێ هونەرمەندی کوردیش کە لە سوید دەژین بەشدارییان کرد بە کۆمەلە تابلۆیەك کە (نەژاد سەرکان، بێستون عەبدولا، موزەفەر نامداری) بوون. پێشانگایەکە بە ناوی (EN BRO TILL KURDISTANS KULTUREN) و ئامادەبووان و هونەرمەندەکان گفتوگۆیان کرد، سەبارەت بە ناوەڕۆك و شێوازی هونەری تابلۆکان.

# دو لاوی وەرزشکار

٦-٧ سالْ نەبوو کە گوندەکەیان کەوتە بەر هێرشی دڕندانەی دوژمنانی کوردەوە و هەشت کەس لە خەلکی بێتاوانی ئەو دێیە کە یەکێك لەوان باوکی ئەوان بوو شەهید بوون. ئەو خەلکە بێتاوانە ناچار وڵاتیان بەجێ هێشت و روویان نایە کوردستانی باشوورەوە. پاش سەردەمێکی پڕ لە کارەسات و دوور و درێژ، کەوتنە سوید و لە کەمپی فاگشتا گیرسانەوە. لەوێ توانییان تیپی فووتبالی کوردستان پێك بنێن و گەلێ چالاك بوون. لە سالی ١٩٩٠دا هاتنە شاری ئیسکیلستوونا و عەزیز بوو بە کاپیتانی تیپی کوردستان و گەلێ سەرکەوتنی بەدەست هێنا. سالی ١٩٩٢ لە پێشبڕکێیەکی راهێنانیدا لە نێوان تیپێکی سویدی و تیپی کوردستان، قاچی عوسمان شکا. عوسمان زۆر جار لە کۆمەلەی کوردستانیی ئیسکیلستوونا خەلاتی وەرگرتووە. گەلێ جار لە لایەن تیپە سویدییەکانەوە داوا لە عوسمان کراوە کە بڕوات و لەوێ یاری بکات، بەلام ئەم پێی وایە کە یاری لە تیپی کوردستان وەك خەباتە لە سەنگەرەکانی کوردستان. عەزیز و عوسمان داوایان لە فیدراسیۆن ئەوەیە کە تیپێکی نەتەوەیی سەرانسەری لە سوید دامەزرێنن.

* * *

# ئەوئاهەنگێکی نەورۆزیانەی خۆش



نەورۆزی ئەمساڵ لە شاری ئیسکیلستوونا، لە شەوی ٢٦ی مارس بە بەشداریکردنی هونەرمەندانی کوردستانی باشوور، کە لە لایەن فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانی سویدەوە دەعوەت کرابوون، پێکهات.

بەڕێزان تەحسین تەها، فوئاد ئەحمەد و هەردوو گرووپی گۆرانی و مۆسیقای هەڵەبجە و ژێر، بە ئامادەبوونی ٦٠٠ کەس لە شارەکەمان و دەوروبەریش، ئەو ئاهەنگەیان ڕازاندەوە. ئەوەی شایانی باسە، ئاهەنگەکە بە دڵی زۆربەی خەڵکەکە بوو. لە کاتی ئاهەنگەکەشدا خەڵاتی هونەرمەندان کرا لە لایەن دڵسۆزانی شارەکەوە.

# هەشتی مارس، ڕۆژی ژن



* ڕێکەوتی ٨ی ٣ کۆمەڵەی کوردستانی بەشداریی لە ڕۆژی ژناندا کرد، کۆمەڵێك ژن شیرینیی کوردییان دروست کرد و تیپی هەڵپەڕکێی لاوانیش چەند هەڵپەڕکێیەکی جوان و ڕازاوەیان پێشکەش کرد.

# هەندێك لە چالاکیەکانی کۆمەڵەی کوردستانی لە ئێسکیلستونا

پاش کۆنگرەی نۆیەمینی ئاسایی کۆمەڵە، کە لە ڕێکەوتی ١٩-١٢-٩٣دا بەسترا، کار و خەباتی کۆمیتەی کارگێڕی رابردوو پەسەند کرا.

لە ١٢-٣-١٩٩٤دا کۆبوونەوەی ئەندامانی کۆمەڵەی کوردستانی لەئیسکلستونە بەسترا. ئەمە یکەمین کۆبوونەوەی ئەندامانە لەم ساڵەدا.

گرنگترین کار و خەباتە ئەنجام دراوەکان:

* بە ناوی کۆنگرەوە نامەیەك (بە سۆرانی و عەرەبی) ئاراستەی کوردەکانی کۆمۆن کرا، کە بێنە نێو و پاڵ چالاکیەکانی کۆمەڵەمان.

* کۆمیتەی کارگێری کۆمەڵە چوار کۆبوونەوەی ئاسایی کردووە. لە گەڵ تیپی فوتباڵدا کۆبۆتەوە. خولی پێشبڕکێی تەختە لە لۆکاڵی کۆمەڵە لە ٦،٥ و٧ی مانگی ٢دا، هەروەها سیمینارێك لە ٢٢ی مانگی ١دا لە سەر رەوشی سیاسی و ئابووریی کوردستانی باشوور لە لایەن ماجد رەواندوزی گیرا.

* لە ٢٨ی ١دا شەوئاهەنگی یادی ٢ی ڕێبەندان وکۆماری کوردستان لە مەهاباد بە هاوکاریی لاوان و گرووپی ژیر و تیپی فووتباڵ شەوێکی خۆش برایە سەر.

* سیمیناری دووەم لە سەر مێژوو و ژیانی کوردی فەیلی و باری سیاسیی ئێستایان، ژمارەیەك لە دڵسۆزانی ئەم مەسەلەیە ئامادەبوون. زانیارییەکانیش لەلایەن دکتۆر ئەنوەر حسێن پێشکەش کرا کە لە ١٢ی ٣دا بەسترا.

* ڕێکەوتی ٢٥ی ٢ شەوێك بۆ خێزانە کوردەکان پێك هێنرا لە Parkkällaren.

* ژمارەیەکی گۆڤاری ئارارات کە بە ٣ زاراوەی کوردی و زمانی سویدی دەردەچێت، کەوتە بەردەست خوێنەرانەوە.

* کۆمەڵە و کۆمیتەی سویدی لەگەڵ حیزبەکانی (کە نوێنەریان هەیە لە کومونداا) کۆبوونەوە، پێشنیارەکەمان قبووڵ کرا کە تلگرامی ناڕەزایی بۆ سەرکۆمار و پەرلەمان و سەرۆك وەزیرانی تورکیا بنێررێ، دژ بەو کردارە نادیموکراسیانەی پیادە کراون.

* ڕێکەوتی ٢٤ی٣ لەگەڵ کۆنگرەی ساڵانەی Föeningsrådدا بەشداری کرا. کۆمەڵەش هەڵبژێردرایەوە بۆ کۆمیتەی کارگێری یەکێتیی کۆمەڵە و گرووپە جوراوجۆرە بیانییەکانی شارەکە کە ژمارەیان ١٥٠ دانەیە.

* ڕێکەوتی ١٨ی ٣ سیمینارێك لە سەر یادی قڕکردن و چەکی کیمیاویی شاری هەڵەبجە لە هۆڵی (ABF)دا گیرا، کە دوو شاهیدی واقعیی نێو ڕووداوەکە (ژیان و گۆران مەحموود) و دکتۆر جەلادەت بەدرخان پێشکەشیاز کرد.

* چاوپێکەوتنێکی ڕۆژنامەگەری لەگەڵ (ژیان و گۆران مەحموود)، بۆ یادهێنانەوەی بەسەرهاتی هەڵەبجە و کوشتارەکەی، لە لایەن ڕۆژنامەی (Kuriren) و (Folket)ەوە.

* ڕێکەوتی ٢٠ی ٣ ئاگری نەورۆز کرایەوە لە (ÅRBYSTUGA)، وتاری کۆمەڵە لە لایەن بابی ئاراوە خوێندرایەوە، بە شایی و هەڵپەڕکێ ئێوارە کە بە سەر برا.

* ڕێکەوتی ٢٦ی ٣ ئاهەنگی نەورۆز بەسترا لە (Parkenzoo) بە بەشداریی ٦٠٠ کەس، وتار خوێندرایەوە لە لایەن سەرۆکی کۆمەڵە بەڕێز.

کۆمیتەی کارگێری کۆمەڵەی ئێسکیلستوونا

* ڕێکەوتی ٥ی ٣ بە شداریکردنی کۆمەڵە و ئەندامانی لە کردنەوەی پێشانگایەکی هونەریدا کە هونەرمەندانی کوردستانی باشوور (سلێمانی و هەولێر و دهۆك) و سوید تابلۆی خۆیانیان تێیدا ئامادەکردبوو، پێشانگاکە بەناوی (kudistans ljus) بوو کە (Lars Kollberg) ئامادەی کردبوو.

پیرۆزکردنی ساڵی نوێ، جەژنی نەورۆز

ئێوارەی ٢٠ی ٣ سەدان ژن و پیاو، لاو و پیر، کوردی هەموو پارچەکانی کوردستان و دەیان سویدی پێکەوە، ئاگری نەوروزیان بە هەڵپەڕکێ و مۆسیقای کوردی و خۆشی، لە ئیسکیلستوونادا کردەوە، بەخێر هاتنیان لە ساڵی نوێی کوردی و بەسەرچوونی وەرزی زستان و سەرما و بووژاندنەوەی سروشت کرد. ئەم ئاهەنگە لە گەڵ دەنگ و باسی بەشەکانی کوردستان کە لە وتاری سەرۆکی کۆمەڵەدا بە ئامادەبووان ڕاگەیەندرا، کاتێکی شادی بە گشت بەشدارانی کۆمۆنی شارەکە بەخشی.


ناوەندی چاپ و رازندانەوەی مەنسوور لە ئیسکیلستوو
==========
* برنامەی کەمپیوتێر بو نووسینی کوردی و فارسی و عەرەبی
* دارشتی خەتی کوری (عەرەبی و لاتین) بو هەموو جۆرە بەرنامەیکی کەمپیوتێر
* چاپ و پیت چنین

Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê, Komiteya Swêdî û nûnerên partîyên ku di Meclîsa Belediyeya Eskilstunayê de tên temsil kirin, bi munasebeta girtin û standana mafên destnedanê yên 6 parlamenterên Kurd, bi hevdu re ji dezgahên blind yên Tirkiyeyê re, nameyeke protestoyê şandin.

Ji serokkomar, serokwezîr, Wezîrê Karûbarên Hundur û serokê Parlementoya Tirkîyê re

Em sîyasetvanên aktiv yên li Eskiltunayê (Swêd), Komîteya Swêdî ya Parastina Mafên Mirovî yên Kurdan û Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê, ew bûyerên dramatîk, teror û kuştina ku beramber xelkê sivîl pêk tê, bi endîşeyeke mezin taqîb dikin.Zîndankirin û paşdestendina mafê destnedanê(immunitet) ya 6 parlamenterên Kurd, li dij demokrasîya qels ya ku li Turkiye heye, tehdîdeke mezine.

Partiya Demokrasiyê (Dep) ji ber kuştin, tehdît, zindankirina endaman û bombekirina lokalên partîyê, naçar ma ku xwe ji hilbijartinên deverî yên 27-ê Adarê vekşîne. Nebeşdarbûna DEP-ê ya hilbijartinan nişan dide ku ev hilbijartin, ne hilbijartinên demokratik in.

Tirkiye peymanên Yekitiya Neteweyan û Konseya Ewrûpayê yên ku ji bo mafên mirovî û azadiya bîrûbaweriyê hurmetê nîşan didin, imze kiriye. Lê Tirkiyeyê di mesela Kurdan de, tu hurmet nîşanî van peymanan nedaye.

Em daxwaz dikin ku ew 6 parlamenterên Kurd yên zindankirî bi zutirîn wext bên berdan û mafên wan î parastina sîyasî paş de bê dayîn.

Till Turkiets president, statsminister, inrikesminister och parlamentets talman.

Vi aktiva politiker i Eskilstuna, Svenska kommittén för kurdernas mänskliga rättigheter och Kurdiska föreningen i Eskilstuna har alla med oro följt den senaste tidens dramatiska upptrappning av våld i Turkiet i form av döds-skjutningar och terror mot civilbefolkningen.

Arresteringen och upphävandet av den politiska immuniteten för sex kurdiska parlamentariker, utgör ett hot mot den redan bräckliga turkiska demokratin.

Demokratiska partiet (DEP) har tvingats att dra sig tillbaka från deltagande i kommunalvalen den 27 mars efter ett flertal mord, hot och arresteringar av partimedlemmar och kandidater samt sprängning av partilokaler. DEP:s tillbakadragande innebär att demokratiska val inte kommer att genomföras.

Turkiet har skrivit under avtal och fördrag i Europarådet och FN, avtal som erkänner respekt för mänskliga rättigheter och yttrandefrihet. När det gäller den kurdiska frågan har Turkiet inte visat minsta respekt för de avtal och konventioner som man frivilligt har undertecknat.

Vi kräver att de sex fängslade kurdiska parlamentarikerna från DEP omedelbart släpps och återfår sin politiska immunitet.

Eskilstuna 940324

Vänsterpartiet

Kristdemokratiska Samhällspartiet

Ny Demokrati i Eskilstuna

Svenska kommittén för kurdernas mänskliga rättigheter

Folkpartiet Liberalerna

Christina Andersson
Centerpartiet

Moderata Samlingspartiet

Kurdiska Föreningen i Eskilstuna

(immune system) parêzgerên laş lewazin û nikarin bergîrî li laş bikin. Wîrus, zu, zu mirov tuşê werimandina boryên bên sitandinê û car bi car jî mirov tuşê werma sîyekanî, qurg û alu dike. Ji ber vî yekê bakteria, vîrus ûvt dibin sedemên serekî ên mirinê. Eger ku mirov hest be ne aramî ya laşê xwe kir (ji bo mirov bizane ka gelo vîrus (HIV) di laşê mirov da heye an tune ye) divê mirov peywendi bi tîmargay nexweşxana re deyne ji bo ezmunê xwên.

AIDS lê rêgay ezmunê (tehlîl) xunewe (blod test) dest nîşan dikrê. Li her timarga (Vjrdcentral) û nexweşxanekanî swêd de mirov dikare ezmunê xwuna xwe bike. Derbarey çareserkirina vî nexweşî yê heta nuha tu rêyek yan jî dermanek nehatîye dîtin. Lê hewl û teqelayekî zor di aradaye ji bo dozîna derman û rêya çareserkirinê..

Xwe parastin ji vî nexweşîya bi van rêya dibe:

1-Divê mirov parêzgerê xwe be, vaxtê ku derzî (spruta) bi kar tîne. Ev derzîyên ku ji alê kesên
tên va hatine bikaranîn divê tucar neyên bi kar anîn. Bi taybetî ew derzîyên ku kesê narkoman bi
kar tînin.

2-Xwe parastin di waxtê peywendî yên cinsî (sex) li gel kesanê din.. Livra bê guman mebest be
kar anîna lastik (kondom)e. Rêya peywendî cinsî, rêya herê aktuele iro di neqilkirina wîrusa HIV de. Divê mirov xwe baş biparêze.

*

# KILAMEK JI BO BEKO

Firat Nemrud



"Kilamek ji bo Bekoyî" navê filmekî kurdî ye û ji aliyê hunermendê Kurd Nizamettin Ariç (Feqîyê Teyran) ve li Ermenîstanê, li gundekî Kurdan hatîye çêkirin. Di vî fîlmî de rola leşkerênTirkan ji aliyê leşkerên Ermenîstanê ve tê lîstin.. Ev fîlmê hanê li Stockholmê, li sinemaya Zita hate nîşandan. Gelek caran, ji bona çuyîna hundur bilêt bi destê mirov nediket.

Mijara vî fîlmî, li ser êşa gelê Kurd e û qetliama çekên kimyewî tîne ziman. Nizamettin Ariç (Beko) leyistikvanê serekî ye. Birayekî wî heye ku ji bo ji Tirkan re leşkeriyê neke, direve û dikeve nava refên pêşmergeyan. Piştî vê yekê leşkerên Tirkan digrin ser gundê wan û Beko digrin. Lê Beko di rê de ji destên lewwşkeran direve û dikeve dû birayê xwe. Bi gelek zehmetîyan digêhêje Kurdistana başûr. Li cem hindek malbatên ku ji şer reviyabûn dijî. Beko qetliama çekên kimyewî dijî û hemû kesên ku Beko ew nas dikir, di vê qetlîamê de dimrin. Bi tenê keçeke piçuk bi birîndarî difilite. Beko di gel vê keçikê xwe digihîne Almanyayê.

Nizamettin Ariç di fîlm de, zêdetir li ser jîyana dijwar ya zarok û jinên Kurd rawestiyaye, êş û azara wan aniye zimên. Ev filmê hanê li gor agahdariyên ku ji Nîzamettîn Ariç bi xwe hatiye stendin, heta nuha yanzdeh xelatên cuda wergirtiye. Ev fîlm dê payizî de bê Eskilstunayê. Ji ber vê yekê, em naxwazin bi firehş li ser binivîsînin.

Bi xwe biçe û bibînê.

# NEXWESÎ YA AIDS

(Acuired Immunodefcinency Syndrome)
Dr: Derzan Bêkes

Hoy ev nexweşîya core vîruseke ku jêra dibêjin HIV(Acuired Immunodefcinency Vîrus). Ev vîarusa cara ewel li Fransa, paşê jî li Amerika yekgirtî hatîye dîtin. Ev vîrusa li nav xaney (Hucre) zindu da dijî. Bo numune xaney laşê mirov. Ev nexweşî ya bi du rêyat nav laşê mirov. Yek ji van rêya peywendî yên cinsî û a din jibi rêya xwun e.

Eger ku kesek ev vîrusa di laşê wê/wî de hebe, dikare kesên din jî tuşê vî nexweşya bike. Bi dayîna xwun yan jî bi peywendî yên cinsî(sex). Hindek car mirov, vî vîrusa di laşê xwe de digerîne, bi ewey ku tu nîşenekî vî nexweşiya pêre hebe. Bo numune li hindek beşên Afrika de %10 ta %15 kes helgirê vî vîrusa ye.

Hindek ji nîşanên girtina vî nexweşya; Ta (feber) girtin, drustbunê deq di post de, gewrebuna limfe gelendekanî laş. Bê guman hêdî, hêdî nexaweş hest bi jarbun û bêtaqetî dike, arezuya xwarin kêm dibe, weznê laşê wî/wê dadikeve. Ji ber hucrey

# ÇEND GOTIN

*Bavê Merwan*

Belê, muhacirî tiştekî gelek ne xweş e û ne dîyar e bê em ê heta kengî li muhaciriyê bimînin. Dil dixwaze ku em rojekê zutir vegerin welatê xwe. Jiyana rojekê ya welatê mirov li hember jiyana salekê ya li welatê xelkê ye. Ev rastîyek e. Ji xeynî me Kurdan, bi miljonan xelkê din jî li derveyî welatên xwe, li muhaciriyê dijîn. Em sedemên vê yekê kêm an zêde, dizanin. Loma jî ez li ser sedemên muhaciriyê ranawestim. Lê hindek tişt hene ku divê em li ser rawestin.

Berî her tiştî, divê her yek ji me xwediyê armancekê be. Hin ji me bi siyasetê dadikevin, hurmeta me ji wan re heye. Lê, hin ji me, ji ber hindek sedeman ne amade ne ku bi siyasetê dakevin. Ji van kesan re jî (Kesên welatparêz) hurmeta me heye. Divê em li hember hevdu bi tolerans bin û ji îmkanên muhacirîyê îstifade bikin. Pir îmkan hene ku mirov dikare jê sud werbigre. Her yek ji me dikare di beşekî jîyanê de bibe xwedî tecrubeyekê. Dema mirov li muhacirên neteweyên din temaşe dike, mirov dibîne ku ew bi gelek tiştan dilibikin û gava îmkanên wan yên vegerê çê dibe, diçin welatê xwe, welatê wan ji tecrûbên wan sud werdigre. Hin ji wan di universîteyan de, hin ji wan jî kursên teknikî dixwînin û hin jî di derheqa karê belediyeyan de dibin xwedî tecrube. Zarokên wan di dibistanên blind de dixwînin. Li gel gelek zimanên biyanî, pirr tiştên din jî fêr dibin.

Kesên ku bi ticaretê dadikevin, ji xwe re sermayeyekê bi dest dixin û dema vedigerin welatên xwe, bi wê sermayeyê cihên kar vedikin. Alîkarîya wan digêje gelek kesên bê kar. Gelek malbat bi Alîkariya wan ji tengasiyê derdikevin û barê jiyanê li ser wan siviktir dibe. Ev tev, tiştên baş in. Ev meseleyeke bi pirralî ye. Ji ber vê yekê jî divê mirov li ser vê meseleyê bi pir alî bifikire. Divê em bifikirin ku em ê jî mîna muhacirên neteweyên din rojekê vegerin welatê xwe. Welatê xelkê nabe welatê mirov. Divê em berî her tiştî, zarokên xwe bidin xwendin. Lewra zarokên me hêviyên me ne. Ew in, yên ku dê pêşeroja me bi rê ve bibin. Xwendina keç û xortên me pirr girîng e. Divê em wan teşvîqî xwendinê bikin. Divê ji derveyî keç û xortan, her weha kesên din yên ku îmkanên wan î xwendinê hebin jî bixwînin. Yek ji wan berpirsiyariyên me yên herî girîng, xwendina zarokan e. Divê em li ser xwendina zarokan pirr rawestin. Xwendin, xwendin û dîsa xwendin......

Heta ji me tê, divê em xwedî ehlaqê baş bin. Em ji hev neqehirin, çavnebarî û hesûdîyan ji nav xwe biavêjin. Divê em dilxwazê hev bin. Gava yekî an yekê ji me, xwendinek bilind kir, divê kêfa me bê. Ger ji destên me bê, divê em alikarîya wê/wî bikin. Hin kes ji me hene ku di nav partiyên Swêdî, Almanî, Fransî û hwd de kar dikin, ango endamên wan partiyan e. Ev yeka hanê ne çewt e. Divê mirov ji ber vê yekê tinazên xwe bi wan kesan neke. Lewra "lobi"tî wilo çê dibe. Mînak; di meha Îlonê de li Swêdê dê hilbijartinên parlamentoyê çêbibin. Îhtimalek gelek mezin heye ku Nalin Baksî ji Partîya Socialdemokratan wek parlamenter bê hilbijartin û têkeve palamentoyê. Ger keçek Kurd bibe parlamenter û têkeve parlementoya welatekî Ewrûpayê, ev ji bo Kurdan jî ne tiştekî hindik e . Dil dixwaze ku hejmara mirovên wisa pirrtir bibe. Hin kes jî dikarin vêya ne baş bibînin. Lê ev jî dîtina wan e. Welhasil divê em bifikirin ku em ê sibê vegerin welatê xwe û bi vegera xwe re jî em ê bikaribin tiştekî bidin xelkê xwe.

Bi hêvîya xwendina zarokan!..

---

# ŞAGIRD

Evîn û Şoreş

Ez wendevan a şagirda
Eyro qiç meşde girda.
Qey welatê ma kurda
Hem rahir û hem pirda.
Ez keynwa Kurda wanena
Zanîne raver bena.
Welatê xu heskenea
Bi zanîn xelesnena.
Bira rasta ti çi benê
Ti çi rahir û pird benê.

Nê bê rahir û bê pirdî
Nê bê zanin benê kirdî.
Ma way û biray piya
Doze xu têdir nê ciya.
Ma xu hedre ker tiya
Rawer nêşin kemaniya.
Ma panc way û biray bî
Kurdistan ra remay bî.
Wexto ma şorin welat
Lazimo kar û xebat.
Ma nêb maşahê kesî
Nê Ereb,Tirk û Firsî.
Bi eql û zanî karkerin
Kurdistan rizgar kerin.

کوردیپێدیا



Folklorê a Y.C komela me bi kinc û govendên xwe ên xweşik roja Jinan xemilandin. Lewra jî herdu rojnamen Eskilstuna resmî wan belav kir û li ser wan awha nivîsîn"Keçên kurda bi kincên xwe ên xweşik , govendên çîrokî pêşkêş kirin.

7- Di roja 13-03-94 an de semînarek li ser Helebce û çekên kimyawi pêk hat. Dr Celadet Çeliker ku semînarê bi rê va dibir, bi şiweyek zanistî qetliama Helebce ani ziman û her waha disan bi awayekî zanistî û bi dirêjayî li ser wan çekên kimyawî ên ku heta nuha li kurdistan hatine bikar anin sekinî. Jiyan û Goran Mehmud ku di nav qetiama Helebce da jîyabûn hîsên xwe û serpêhatî yên wê rojê anîn ziman. Rojnamên Eskilstuna çawpêkewtinek di gel Jîyan û Goran de pêk hîna û rojna ma Kuriren awha ninîsîbu " 5000 kes mirin û ji vî zêdetir kes jî birîndar bûn".

8-Wek tê zanîn li Kurdistana bakur roj tune ku bi dehan kesên Kurd neyê kuştin. Ji alîkî din jî dewleta Turk bi hemû hêzên xwe êriş tine ser roşenbîr û polîtîkacî yên Kurd. Di roja 2/3 adara 94 de meclîsa Tirkan mafê paraztina dîplomasî (imunitet) ji 7 parlement ên Kurd sitend, ku ji vana 6 kes endamên partiya demokrasîyê (DEP) bûn. Ji bo riswa (protesto) kirina vî karê û ji bona balkişandina raya giştî bo ser vê yekê nivîsînekî (debat artikel) li ser navê komela me di herdu rojnamên Eskilstuna de hat weşandin. Her waha di nivîsîna xweda ji raya giştî daxwaz kir, ku çavdêrîya hilbijartina mehelî a di 27 adarêde pêk tê bikin û agadar bin li ser buyerên ku li Kurdistan ru didin. Daxwazî ji parêzgerên mafê mirovayetî û hêzîn demokratik hat kirin, kû piştiwanîya xwe di pîrozkirina newroz û hilbijartina mehalî de nîşanê gelê Kurd bidin.

9- Bi pêşrevîya komela kurdistanê û komîta Swêdî a parastina mafê Kurdan li Eskilstuna di gel nonerên hemû partî yên sîyasî ên Swêdî ku di kommuna Eskilstuna de tên temsîl kirin pêk va nameyekî protestoy hat amadekirin û ji serok Komar, serok Wezîr, Wezîrê hundur û ji serokê parlementoya Tirkîyê re hat şandin. Ev nama ji herdu rojnamên Eskilstuna (Kuriren û Folket) û ji rojnama Azadî, Ozgur gundem, Medya Guneşi, Armanc û ji Berbag re jî hat şandin. Rojnama Folket li ser vê nama awha nivîsî bu, "Hemu partîyan piştiwanîya xwe dan Kurdan".

10- Komela Kurdistanê li Eskilstuna di êvara 20/21 de bi beşdarîya 350-400 kesan bi kêf û xweşî agrê Newroz pê xist. Her waha peyama Komela Kurdistanê hat xwendin. Kesên hatî bi dirêjaya 3 seat li dora agir govend girtin.

10-Şeva Newrozê di roja 26-03-94 de li Parken Zoo pêk hat. Ji Eskilstuna û bajarên dora Eskilstuna nîzikê 600 kesên Kurd û Swêdî di şeva meda amade bun. Hunermendên bi nav û deng Tahsin Teha û Fuad Ahmed bi awazên xwe ên xweşik, Hunermed Zahid bi dengê kemana xwe, grupa Helebce û gruba Jîr bi musîqa û awazên xwe, her waha grupa Folklorê a Y.C. komela me bi govendên xwe ên xweşik şeva me xemilandin. Herdu rojnamên Eskilstuna li ser şeva me nivîsîn. Rojnama Kurîren van ristana "Tu kesên din tunene ku ji keçû jinên Kurdan xweşiktir kinc li xwe bikin waxtê ku diçin kîfxweşyê. Perçên kincên wan ji perçên kincên prensesên cîrokan hatine sitandin" ji bo şeva me bi kar anîbu.

11- pêşberkêyekî Fotboll li roja 3-4-94 de,di navbera du timê komela Eskilstuna, Katrineholm, Sala, Westaras û Orebroda li Eskilstuna pêk hat. Di encamê leistina de tima Eskilstuna Ararat bu bi yekem û dîyarîya yekem, Orebro bu bi duwem û diarîya duwem û tima Eskilstuna Newroz bu bi sêhem û diyarîya sêhem wergirtin.

Komîta Karger a Komela Kurdistanê li Eskilstuna

*

# HINDEK JI ÇALAKÎYÊN KOMELA KURDISTANÊ LI ESKILSTUNA

Komela Kurdîstanê li Eskilstuna di roja 18-12-93 da kongra xwe a 9 hem pêk anî. K.K a ji bona kar û barên komelê hate hilbijartin di komcivîna xwe a yekem da programekî xebatê ji bona 6 mehan (Jan-juni-94) amadekir. Wek ku di programa xebatê da ji dîyare piranîya çalakî yên komela me ketne nav meha adarê. Ji ber ku meha adarê bi xweşî û nexweşî yên xwe ve, bo me Kurdan mehekî gelek giringe. Gelê Kurd di nav ev meha de buyerên him xweş û him jî nexweş jiya ye. Lê, di pêş meha adarê de komela me gelek çalakî yên din ji pêk hînaye ku hindek ji van çalakîyan li jêr hatine nivîsandin.

1- Di roja 01-22-94 de semînareki bi navê "kurte behsek li ser rewşa aborî û sîyasî li Kurdistana başûr" pêk hat. Semînargerê wêsemînare sekreterê P.K.S.K Macid Rewanduzî bu.

2-Salroja damezrandina Komara Kurdistanê li Mahabadê hemu sal ji bal komela meva tê pîrozkirin. Isal şeva biranîna salroja damezrandina Komara Kurdistanê- Mahabad, di roja 28-01-94 de, bi beşdarîya zêdetir ji sed kesê hat pîrozkirin..

3-Di roja 94-02-20 de semînarekî din li ser rewşa Kurdên Feylî pêk hat. Semînargerê wê semînare Dr.Enwer Huseyin bu. Gelek kes beşdarê vî semînare bûn.

4-Di roja 25-02-94 de, êwarekî Kurdî (Kurdisk träff) ji bona binemalên endamên komelê û kurdên li Eskilstuna pêk hat. Çend binemalên endamên komela me beşdar bun.



Wek ku me di destpêkê da jî diyar kiribu piranîya çalakî yên komela me di nav meha adarê e bun. Di meha adarê de germî li Kurdistan dest pê dike, befir hêdî, hêdî dest bi helandinê dike û cihî xwe ji kulîlkên baharê re dihêle. Her çend welatê ku em lê dijîn sar be jî lê, germîya ku li kurdistanê bi meha adarê dest pê dike germîya xwe dide me jî. Lewra em kurdên li dervay welat di meha adarê de çalaktir dibin û gelek çalakîyan pêk tînin. Komela Kurdistanê li Eskilstun di nav meha adarê de gelek çalakîyan pêk anîye ye ku hindek ji van çalakîyan li jêr hatine nivîsandin.

5-Komela Kurdistanê, Komîta Swêdî a parastina mafên Kurdan, ABF Eskilstuna, ABF Sormland, Kostfrämjandet li Sormland û Komela Y.C. li Katrineholm pêkva pêşangahekî resim bi navê "Kurdistan Ljus" ji bo 20 rojan (5-25/03/94) li salona pêşangah (konsthalen) a ABF li Eskilstuna pêk anîn. Ev pêşangaha ji wêneyên çend resamên Kurd ku li Kurdistana başûr dijîn (Namik Hemeferac, Ismail Xeyat û Namiq Ali Qadir) û çend resamên kurd ku li Swêd dijîn (Biston Abdulla, Necat Serkan û Muzafer Namdarî) pêk hatibu. Herdu rojnamên Eskilsstuna bi dirêjayî li ser pêşangahê nivîsîn û bi sedan kesan vî pêşengahê dîtin. Rojnama Kuriren sernivisa (rubrik) "ceneta ku xirakirin" bi kar anîbû.

